# Strana Kurmancî

## Berhevkar: Cankurd

**Weþanên Taybet ên Kovara Mehname: 7**
Sal 2001
Copyright © Cankurd & Kovara Mehname

## Di vir de van stran û dûrik hene:


Axao, Axao..!
Azê
Baranê!
Bavê Fexro
Bazo !
Bedirxan
Bêmalê
Bêrîvanê
Bistkî Wer
Cana min
Canê
Cano
Casimo
Çaçano
Çeko bilindo
Çeqilmast
Dankutan
Dawidê Dêwid
De bese
Delal
Delal
Delalê çiyayê Mazî
Delal ê Qerej-Daxê
Delal Ha wer delal
Derdo
Derwêþê Evdî
Diyarê Bilind

Dilo
Dîlber
Dînê
Dûrik
Dûrik

## Axao!..Axao!...

Axao!... Axao!...
Biçûko, xeþîmo, nûgihao!
Rêsê mehkûma û çetao!
Eþîra giran jê bi þûn da mao!
Kaniya Hewrizê biþewite, ji kula dilê min re, wa bi dar û dirî..
Mi dî Þemsê bi sê denga dikir gazî,
Ban (bang) dikir Qenco !, birao !...
Firqe qomandarê dewletê li wî gawirê þefqe kirî,
Mi dî Qenco bi sê denga kire gazî,
Ban dikir Þemsê porkurê, nemayê!,
Rab' berê xwe bidê Mêrdînê xopan,
Cem mala Þêx Tahir, Þêx Ensarîye, here gilî,
Tu ê bibêjî Þêx Tahir, kuþtin Eliyê Ehmed,

Beranê poþek, gamîþê tirka, beranê soring kirî,
Ez ne ketime ber heyra malê dinyayê,
Ez neketime ber heyra kuþtina mêra,
Keyfa min tê li wê heyfê,
Çawan çira mala bavê min, ji êvara Xwedê de vedimirî...
Axao!.. axao!...
Biçûko! Nûgihao!
Kevirê þîfê dêrê Ermeliyao...!

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

# Azê!

Aze yî, tu aze yî,
Weleh, bileh tu Aze yî,
Kûçik tu pir fitne yî,
Fitneyê gundê me yî,
Aze tu bavê Madiyê.
Te rahiþt tûrê parseyê,
T'daket binya xetêyê,
T'sed olçek micbî kirin,
T'destê xwexist çalêyê,
T'berê xwe da Nisêbînê,
Baþçawîþê Stelîlê,
B'çavê serê xwe dibînê,
Destê Azê b'kelemça dixînê,
Berî didin Mêrdînê.

Nûrê radibe dilerzînê,
Hebana derewa bi xwe re hiltînê,
L'Midyatê direþînê.

Aze çû bû Diyarbekir,
Serbarê Azê þekir,
Beqala l'hev zêde kir.

Qesra Azê du kulek,
Jê firya bûn du ordek,
Tu l' riha Azê binêr,
Wek teriya kuç'kê belek.

Qesra Azê du qozî,
Jê fir'ya bûn du horî,
Tu l'xweha Azê binêr,
Weke gîska hat ber nêrî.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

# Baranê!

Baran barî bi nîmeta,
Rûkê erdê kir xeta,
Ramîsanê keçika li mala bavê adeta,
Li mala mêrik qehbeta..
Were lê lê Baranê!
Baran barî bi zenbîla,
Rûkê erdê kir bîra,
Ramîsanê keçika xweþ in l'malê d'wezîra,
Hawar lê lê baranê!!..
Ka sozê bin eywanê,
Ka xwediya kesrewanê,
Reþiyê þarê berdanê,
Hawar lê lê baranê...

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Bavê Fexro

Bavê Fexro mi stra bû, te ji mi re tew kir,
Gundî û maliya bi mi û te bû, te derew kir..
Way li minê, way li minê..
Gidî delal.. Bavê Fexro !...
Ji Farqînê heta Hadiya çiyayê Mezin,
Bala xwe da banê çiya Dêra Mezin
Bala xwe da hûrdeviya, ji xwe re binêre li konreþa keriyê miha..
Îro sê ro, Bavê Fexro nexweþe li nav ciya..
Way li minê, way li minê..
Gidî delal, Bavê Fexro,
Ezê bi çepilê Fexro bigirim, birevînim,
Bavêm Kerengo, gundê Êzdiya,
Kê go bîra Kerengo genî bûye ji kuliya,
Çavê min, Bavê Fexro, kul bûbû ji toza dû keriya..
Way li minê, way li minê, gidî delal, Bavê Fexro!...
Wextê ez pîr bûm,
Wextê ez pir ezîz bûm,

Wextê ez bi dergistî bûm, ez meqbûl bûm,
Wextê ez ketim bin darê kopekê mêrê xerab, ez kal û pîr bûm..
Way li minê, way li minê, gidî delal, Bavê Fexro..!
Ev buhar e, xweþ buhar e, Bavê Fexro,
Li Gencê siwar nebe, dîn û har e,
Mi dî hatî cewaba nexêrê, go Mihemmedê Fexro
Bi sê gullayên tematîkê birîndar e..
Way li minê, way li minê, gidî delal, Bavê Fexro..!
Ji Helebê wê de Þam e,
Þal û þapikê Bavê Fexro bi þalqitmîrê ne timam e,
Gidî delal, gidî delal ..
Way li minê, Bavê Fexro..!
Ji Farqînê heta miqabilê mala me, tevde distira,
Mi ji te re go xwîþkê, te go bira..!
Gidî delal, gidî delal,
Way li minê, way li minê, Bavê Fexro..!
Ezê herim wê Amûdê, wê çarçiyê,
Mi dî xortik çû wê serayê, wê belediyê,
Mi li eslê vî xortî pirsî, go Mihemmedê Fexro, þêrê çiyê..
Way li minê, way li minê, gidî delal, Bavê Fexro..!
Ez hiliyam tu bihilî...

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Bazo !

Bazo!, bazo!
Li me hatî danê êvara,
Sihê diyara xwe berda kokê zinara,
Xwezî hakîmkî a'dil, di welatê me rabûna,
Bila çeplê jina qenc bigirta,
Bila berda ji kotî pîsa, ji mirdala,
Bila bida çeleng siwara, stranvana..
Bazo !, bazê mino!
Ruhnîka herdu çavê mino!
Ji war ocaxê mala bavê mino!
Bazê xelkê te bejin ziravo, ji terha benkê..

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Bedirxan

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!

Milê Xanê, xweþ Mile Xanê!
Bejna Bedirxan beg zirave mîna bîna zila, bîna rêhanê,

Þemo yê Dêrþewî kire gazî:
Osman paþa kûçik bab,
Destê babê Têlî, mîrê Botan, þêrê Kurda,
Bi te nayête girêdanê..
De lo lo.. Lo lo...
Li me tê dengê topan û cebexan,
û li me tê heyfa bo mixabina dilê me dimîne,
kûçikê koþterê
Romiya,
ketne þarê Cizîra
Botan,
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê axan û
eþîretê..

Lê lê Meyro!
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!
Milê Xanê bilinde le ( li ) dewrê rêyo,
Osman paþa yawork kiþande qoça Mîsile,
Ez dikim û nakim qewata min naþêyo,
Bila qewateke giran hîja ji mira bêyo,
Topê mezin bila ji mi ra bêy,
Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî,
Þemoyê Dêrþewî,
Kopikê îro serê heft sala li çiyayê Ewreqê bîne
asêyo..

De lo..lo..lo..lo..!
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê,
heyfa bo mixabina dilê me

dimînê,
Kûçikê koþterê Romiya, bi ser welatê þarî Cizîra Botan da,
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eþîretê..

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!..
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!

Milê Xanê daketim wa Bilayloka,
Osman paþa yawork kiþand qoça Mîsila,
De bila bît ji me ra topê tembiçîka,
Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî,
Sê roja þer dikin li geliyê Ewreqê wekî keyfê zava û bûka,

De lo..lo..lo..lo..Lo...!
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê,
Heyfe bo mixabina dilê me dimînê,
Kûçikê koþterê Romiya,
Ketne þarê Cizîra Botan,
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê mîran û eþîretê..

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê, xweþ Mile Xanê!
Bedirxan beg dike gazî..

Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî,
Þemoyê Dêrþewî kire gazî:
Mîro! Emê çawa þerî nakeyn be eþq û dila?!
Evro þer bi me herçar xweþ mêra,
Mîna keyfa zavyan û xemla bûka,
Mîro! Ma te nezanî li me hate kuþtin Tahîrê biçûka?

De lo lo! ..lo lo!
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê,
Heyfa bo mixabina dilê me dimînê,
Kûçikê koþterê Romiya,
Ketne þarê Cizîra Botan..
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê Sanceqa eþîretê..

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!..
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!

Milê Xanê, xweþ Mile Xanê!
Mîr Bediraxn bi sê denga kire gazî,
Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî,
Þemoyê Dêrþewî.
Osman paþa sekinî li Cizîra Botan,
Bi rojê eskerê xwe kom dike,
Bi þevê berê lê dikete ser rêza gunda,
Ev þev min divê bavêne ser ordiyê vî kûçik babî,
bibirrin serê topcî û qumandara..

De lo lo! Lo lo! Lo lo..!
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê,
Heyfe bo mixabina dilê me dimînê,
Kûçkê koþterê Romiya, ketne þarê Cizîra Botan..
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eþîretê..

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!..
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!

Milê Xanê xweþ Mile Xanê!
Mîr Bedirxan bi sê denga kire gazî,
Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, samiyê Lotî,
Þemoyê Dêrþewî.

Osman paþa sekinî li Cizîra Botan,
Bi rojê eskerê xwe kom dike,
Bi þevê berê lê dikete ser rêza gunda,
Ev þev min divê bavême ser ordiyê,
Vî kûçik babî, bibirrim serê topcî û qumandara..

De lo lo! Lo lo! Lo lo..!
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê,
Heyfe bo mixabin dilê me dimînê,
Kûçkê koþterê Romiya,
ketne þarê Cizîra Botan..
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa

eþîretê..

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!..
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!

Milê Xanê xweþ Mile Xanê!
Mîr Bediraxn bi sê denga kire gazî,
Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî,
Þemoyê dêrþewî.

Osman paþa sekinî li Cizîra Botan,
Bi rojê eskerê xwe kom dike,
Bi þevê berê lê dikete ser rêza gunda,
Ev þev min divê bavême ser ordiyê vî kûçik babî,
bibirrim serê topçî û qumandara..

De lo lo! Lo lo! Lo lo..!
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê,
Heyfe bo mixabina dilê me dimînê,
Kûçikê koþterê Romiya, ketne þarê Cizîra Botan..
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eþîretê..

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!..
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!

Milê Xanê xweþ Mile Xanê !
Bi va Bidara û Bilalîka,
Herine þarê Cizîra Botan, xweþ tê dengê zavayan û bûka..

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!
Zeyneb xatûn kire gazî li Mûsil û Bexdayê,
Topa radikêþîne Tapan paþa,
Topê Kelê Reþ ji me ra îna,
Osman paþa koma bendê te dane gazekê, wan pîra û biçûka..

De lo lo! Lo lo! Lo lo..!
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê,
Heyfe bo mixabin dilê me dimînê,
Kûçkê koþterê Romiya, ketne þarê Cizîra Botan..
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eþîretê..

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!..
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!

Milê Xanê, xweþ Mile Xanê!
Mîr Bedirxan çû seyrana serê,
Meyt kêþane mîna kayê li coxîna,
Leþê esker û top û cibexane mane li çolîna,
Bang kir siwara þerî betal ken (biken) hing

razîne?

Þemoyê Dêrþewî kir gazî:
Meyro dane ba Dêrgula rengîn ciyê meye,
destê me bê ser lê we nabe..

De lo lo! Lo lo! Lo lo..!
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê,
Heyfe bo mixabin dilê me dimînê,
Kûçkê koþterê Romiya, ketne þarê Cizîra Botan..
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eþîretê..

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!..
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro..!

Milê Xanê, xweþ mile Xanê!
Zeyneb xatûn pêþ eskerê Osman paþa ve çû,
Celemê hespê Osman paþa girt û berneda,
Osman paþa ketne tora te û babê te,
Destê babê Têlî beg heta bajêrî Diyarbekrê, li kelepçe mede..
De lo lo!..Lo lo! Lo lo...!
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê,
Heyfe bo mixabin dilê me dimînê,
Kûçikê koþterê Romiya ketne þarê Cizîra Botan..
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa

eþîretê..

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Bêmalê ! (*)

Bêmalê me te dî li hay Wanê (1),
Piþta xwe da erdewanê (2),
Ramîsana te bûn (3) parîk þekir, ketine (4) ber vê (5) zumanê,
Rebenê! soz û qirar temam bûne,
Gul û beybûna bi hev ra bûne,
Heþiya qazê li bejna zirav bela bûne,
Rebenê kerasê sipî li xwe meke, sare, çile li te sare,
Bi te ra soze, yek qirare,
Xeynî bejna zirav ji xwe ra nagirim dost û yare,
Gava tu bi xortê gundî biþtexilê li min zulme, li te qare (6),
Kina min a li nav kina,
Bejn (7) avî rihan e, av li bin e,
Emê herin welatê xerîbiyê,
Ji Xwedê û pê ve kesik (8) nuzane em ku ne..
Ez çûm welatê xerîbiyê, mi ji bîr meke,
Mi bike sêvê (9) Xelatî, a dî di berîka xwe ke,
Gava bêm bîrê, sêv biderêxe, a li ber bêvla xwe ke,
Suwar (10) dibû li ciwaniyê (11),
Berê xwe da welatê xerîbiyê,
Xemê min ne tiþteke, qese tembariyê,
Kirasê sohr (12) li xwe meke, li te nayê,
Kanî soz û qirar, te bi mi ra (13) dayê,
Tu pey soza (14) xwe nayê,

Li xatirê te sê sal (15) ketim belayê,
Gava te nebînim sebra mi nayê,
Li kullekê meke tarî,
Dev li kanê gul dibarî,
Were cem min, destê xwe deynim li ser sîngê bi h’elal malî,
Mi te dî bû li ser dêkê,
Delalê min hat, li te e’bakê (16) wê ban dikê,
Xwedê muradê me herdu (17) tevda bikê,
Minê (18) dî bû ser dirûnê,
Hesso hesiya, vê ra dikê (19) pevçûnê,
Bejna min (20) gula nû xemilî,
Ser min û delalê min (21) çûne gilî,
Gava te nebînim agir (22) ser dilê min (23) þuxulî,
Çi subeye (24)? subake sarî,
Li kullakê meke tarî,
Destê xwe di destê mi ke,
Emê hevdu birevînin pisarê (25) vî buharî,
Ezê bimirim (26), tu sebebî,
Tirbê min (27) li mala bavê te bî,
Gava tu biborê, lingê xwe li tirbê mi xe,
Bê set (sed) reh’met li te bî,
Çiyayê bilind bê ba nabê,
Newalê kûr jê av xalî (28) nabê,
Qîzê vê heyamê ji heft (29) sala
û pêve li mala bavê xwe bê dost û yar nabê..
-----------------------------------------

(*) Socin û Prym - St.Petersbourg 1890,

Têbîniyên, ku li binê text (têkst) hatine nivîsandinê:

(1) dî bû li lay Wanê. (2) wêrdewanê. (3) bûne. (4) ketne. (5) vî. (6) qehre.

(7) a te. (8) kes. (9) sêva. (10) helqê delal suwar. (11) ceniyê (12) sohra.

(13) mir. (14) soz û qirara. (15) sê sala. (16) malê me, li te ébayê.

(17) bê malê. (18) min. (19) serê subê Heso dayê þer. (20) mi.

(21) delalê malê. (22) agirê. (23) mi. (24) subake. (25) bi serê.

(26) bimirime. (27) mi. (28) bê av. (29) heft.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Bêrîvanê !

Bêrîvanê, bêriyê di gundê me çil û çar û çarde ne;
Li mehalê jêrî sê qipla (qible) ne,
Qipla birekî, hemî keçin malbatîne, bê lome ne,
Û qipla navê, bûkê di salê ne, û di bêgazinda ne,
Û qipla dumahîkê hemî keçê di desbijarî, di nav min û te..
Bêrîvanê, spêde ye, xweþ tê dengê mihêkar tê,
Heko tu Bêrîvanê min nas nekî,
Wê li nav çil û çardeh bêriye þala li serê sor û zer tê..
Bêrîvanê, pezê mala babê Bêrîvanê pezê sipî ye,
Þivana dê bêjite:
“Bêriya, were, dê bihnekî bikin yariyan û laqerdiyê”.
Eger ez biçim mal, bab û birakê di min bêjin: “Eve çî ye? “..
Bêje:”Lepkê di parzonê min qetiya bû, û e’yar sîrka min reþtiye..”
Bêrîvanê, barekî titinê hatiye gundê me, titinê zer e,
Xelk û a’lem kirrîn bi rûnî mehan,

Ez dê bo lawikê xwe kirrim bi dirav û zêrê zer e
Û heko lawikê min qaîl nebit,
Ez dê cotê zermemka danîm li ser e..

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Bistkî Wer

Bistkî wer mala me ye,
Tiþkî bibe ma’ne ye, ( hîccet )
Singê mi j' te re bexçe ye,
Gul û rîhan têde ye..

Meskenê min û te ye,
Hey lê gidyê nazliyê çelebiyê,
Xulama deqe li eniyê,
Wer em herin kaniyê..

Gundî, malya çi j' me ye,
Diyarbekir bi derge ye, ( dergeh )
Nisêbînê bi qiþle ye,
Girherînê bexçe ye..

Mêrdînê di ser re ye,
Cihê min û te ye,
Hreview û hogira çi j' me ye,
Îþev þeva berfê ye,
Ciya ye, li hewþê ye, (ciya dîne li hewþê ye ?!)
Destê xwe, b’ destê mi de,
Wer em herin çolê ye..

Îþev  þeva baranê,
Ciya dîne li heywanê, (eywanê )
Destê xwe b’ destê mi de,
Emê biçin newalê..

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Cana min!

Rêka Midyatê qaþe, cana min!,
Derpiyê Helîm qimaþe, cana min,
Ereq vexwar serxwþe, cana min,
Dikim herim Helebê, cana min,
Qeysa bejna xwe bigre, cana min,
Te d’ bînim de (te) nabînim, cana min,
Te d’ gerdenê wertînim, Ezîza min,
Xelk evdala malê dinê, cana min,
Ez aþiqê çavê þîn im, Ezîza min,
Dikim herim Mêrdînê, cana min,
Qeysa lingê xwe bigre, cana min!,
Ji te r’ bînim potînê, cana min!,
Xelk evdala malê dinê, Ezîza min!,
Ez aþiqê çavê þîn im, cana min!,

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Canê!

Keçka Mîrê Swêrekê,
Kumber ketê kêlekê,
Tu b’ qedrê rebê xwe kê,
Biþkoþkê êlek vekê,
Devê min d’ memkê xwe kê.

Can hey can,
Keçka Mîrê Mûsilê,
Kumber ketî ser dilê,
Çavreþî  me þenbilê,
Can hey can,
Can hey can...

Kirasê te mebrûm e,
Hûr û kûrik didrûme,
Heçî yarek wan tune,
J’her du dinya mehrûm e.
Can hey can..

Kirasê te meles in,
M’ da ber derz û meqes in,
Heçî yarek wan tune,

J’her du dinya bê mal e.
❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Cano

Wele (1) Cano (2), wele Cano !,
Konê me reþin e´rebîne,
Keçkê gundê (3) me spehîne,
Xortê gundê me begîne,
Minê e´cêbek dî bû;
          qîz û xorta bi ramîsana ji hev razîne.
Wele Cano, wele Cano !,
Çav (4) reþê çavê xwe kil dikêwo,
Xizêmeka zêrînî (5) di poza (6) wêwo,
Par vî çaxî el (ez li) mala bavê te Dêwid bû (7),
Te yariya (8) xwe dibilave xelkêwo,
Wele Cano, wele Cano !,
Mala (9) me bar kirin danîn li zozana,
Çavreþa bisk bi têl (10) ji me xwîyane,
Qîzê mîrê Reþkûta nû gihane..
Wele Cano, wele Cano !,
Beqçakê bavê Bendê wa bi tirî (12),
E’sker gerane li ber buhorî,
Bavê Bendê barê xwe da seferê (13) vî gawirî.
Wele Cano, wele cano !,
Sê (14) lawê Yûsîf paþa li vê derê (15) buhorin,
Barê xwe dan þehrê vî gawirî (16),
Sê xatûn çavbelek manane markirî (17).
Wele Cano, wele Cano !,
Mûþa þewitî bi tutûne,
Þerwalê (18) hersê kurê (19) Yûsif begê

kalebdûne, (20)
Ser seferê vî gawirî diçûne..
Wele Cano, wele Cano, Mûþa þewitî bi kaniye,
Di ber re hat e´sker ê romiye,
Hersê lawê Yosif paþa ser þehr ê gawir çûne.
Wele Cano, wele Cano, îro sê ro me karik nekir,
Minê dûvê hespê boz bi xene kir,
Yûsif paþa qebûl nekir.
Wele Cano, wele Cano, li min û li vê yekê,
Kerîm paþa serkê (21) ordiyê,
Hersê lawê Yûsif paþa,
Ber bajara Qersê (22) bi kotakê,
Le me geriye dewra felakê (23),
Wele Cano, wele Cano !,
Mûþa þewitî va biraza,
Kerîm paþa serkê vê ordiyê (24) ji xwe teraza,
Hersê lawê Yûsif paþa, bir (25) bajara Qersê,
li dilê Yûsif paþa bû miraza..

Wele Cano, wele Cano !,
Me xelkê delal dî bû (26) li ber derî,
Bi awirê çava li me dinêrî,
Hersê law ê Yûsif paþa,
Hatin ji Qersê (27) h’emlê (28) va (29) guharî.
Wele Cano, wele Cano !,
Qersa þewitî li ber kaþe,
Xeftanê hersê lawê Yûsif paþa qumaþe,
Kaxezik ji Qersê ji me ra hat,
Go hersê lawê Yosif paþa,

*Yek bû Yûzbaþa, yek jê dibû (30) dalûbaþa, êdî dibû bîmbaþa.*

<u>Têbîniyên, ku li bin ê text (têkst) hatine nivîsandinê</u>:

(1) walla (2) ce’no (3) gundiyê me (4) çe’hv (5) zêrînî (6) Tipiq
(7) Dawid (8) yariyê (9) malî (10) bi têla (11) arê bi wedêno
(12) ji bekçaka nûtir çaxçûrê (13) sînorê (14) hersê (15) li vir
(16) gewrin (17) kirî, kirin (18) Þervala (19) lawê (20) kilab
(21) serîkê (22) kiþandî (23) ekê (24) pêvexistine (25) kerna
(26) pêvexistine (27) bajara Qars (28) hemala (29) Van
(30) bû (31) û yeg bû.
❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Casimo (1)

Berhevkirin: Socin û Prym

Hevaylo, hevaylo, hevaylo !,
Casimo lawo tayê bi tenê,
Hesîn (2) dibû li dor kehniyê, li ber badanê,
Kul bikeve mala Xoce Tomas (3) û Hesen begê (4),
Cohtê (5) xençera (6) xistin ber xetê gerdenê.
Hevyalo, hevaylo, hevaylo,

Casimo lawê pîrê !,
Bi ro here meclîsê,
Bi þev ji xwe ra dayîne ray (7) û tegbîrê,
Heyfê me tê bû ser Casimo, go kuþtin,
Jê xalî dibû meclîsê Zaxoyê, meclîsê (8) Cizîrê,
Hevaylo, hevaylo, hevaylo !,
Casimo lawo qesrê Casimê me (9) piçûk e,
Stûna navê li bin da (10) balalûke,
Heyfê me tê bû ser Casimo (11) ku kuþtin, me qîzik jêre anî, nehîþtin, ku (12) bibin zava û bûk e.
Hevaylo, hevaylo, hevaylo !,
Casimo lawo, qesrê Casimê me mezin e,

Stûna navê li bin da hesin e (13),
Kula Helebê (14) bikeve mala Xoce Tomas,
û Hesen begê (15),
Derkê (16) kuþtinê lêxistin Casimo,
minê qîzik jêra anî,
nehêtin (17)
bibin mêr û jin
e.
Hevaylo, hevaylo, hevaylo !,
Çûme Cezîrê neqaba va begvîna,
Gundî ûa'lem gote rabe cilê Casimê bihîne (18),
Paþak qewî stêre, cil bavêje li ber (19) pevlî xwîn e,
Efendiyê Diyarbekrê û qaziyê Mêrdînê,
riþwet û bertîl dixun a'lemîn e ,
Gotin yadê di þûlê hikumatê hate (20) kuþtin, zerar nîn e,
Hevaylo, hevaylo, hevaylo !,
Casimo lawo !, ro hilat E'lkura navê,
Bûkê rabû cilê Casim da ber tavê,
Heyfê me naye ser te, heyfê me tê li bûkê wê vegere mala bavê.
Ha lawo, ha lawo, ha lawo !,
Zavayê sê mehawo,
Li dîwanê hukmatê newêrim bêjim birawo !...

---

Têbînî:

(1) Casimo (2) þîn (3) Tomas Serrafê Mûsilê (4) Begê þêxa (5) Cohtê
(6) Carê (7) Sêr (8) Mej (9) Casimê me delalê, Casimê

delal

(10)anî nehiþtin ji hev ra (11) Bin dasina (12)arê derbê (13) Wanî Nehiþtin

(14) Kuleke reþ e li ser rûyê mirovan çêdibe û þûna wî her dimîne.

(15) Thomas: serrafê mûsilê. (16) Derbkê. (17) nehêþtin. (18) Bîne.

(19) Cilê casimî li ber bavêje (20) Go dayîkê (21) Hat.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Çaçano!

Ax û yeman Çaçanê!
Sorgulê belibanî,
Çavþînî Çavþeytanî,
Destê xwe b’ destê mi ko,
Heyde ko em herine govendê,
L’wê d’ emê bêne dîlanê,
Tu bi serê ciwanî bigirî,
Emê l’ dev xin gem û lîwanê.

Ax û yaman Çeçiko,
Ava gerê hêniko,
Devê xwe di memkê mi ko,
Weke ava þerbik e,
Xwedê mirada bike.

Ax û yeman Çeçiko,
Ava gerê hêniko,
Devê di memkê mi ko,
Weke ava þerbik e,
Xwedê mirada bike,
Li nav tirikê roniko.

Ax û yeman Çeçenê,
Çeçan mi dî bû li gasînê,
Av dikîþandê b’ misînê,
Ezê Çeço birevînim,
Xwe ba’vên Bekrî axa,
Li wê xopana Rêsînê.

Ax û yeman Çeçanê,
Çavþînê, çavþeytanê,
Mi Çaçan dî bû l’ ser bîrê,
Av dikiþandê bi zencîrê,
Ezê Çeço birevînim,
Xwe bavêjin Cezîrê.

Kirasê Çeço meles e,
Mi da bû ber meqes e,
Heçî dosta wî tune,
Keçik lawê teres e.

Kirasê Çeço mebrûm e,
    hûrik, hûrik didrûme,
Heçî dosta wî tune,
Ji her du dinya mehrûm e.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Çeko bilindo!

Çeko bilindo heramo!, ser çil û çar çiya ketim,
Bilind firîm û nizim ketim,
Bo dêm axî sorgulî, dîn bûm, har bûm, sewdaser bûm,
û bi çola
Xwedê ketim.
Çeko bilindo heramo!, çûme çemê Zîzaniyê;
belê hatime mergê Zîzaniyê,
Qeda û sê sed bela bikevit li xêzaniyê,
Sala vê salê lawikê min,
kete e'skerê Silêmaniyê.

Çeko bilindo heramo!, çiya bê dar nabit,
gelî di kûrin bê av nabit,
Qewlê di eskeriyê dûr û dirêj in, çu cara xelas nabit,
Kî dîtiye li dorya heft zemana,
keç li mala babê xwe,
piþtî heft sala,
li mala babê xwe

bê yar nabit.

Çeko bilindo heramo!, rê li ber e,
Kuriko dîno!, tu kew gêrfanî, kew li ser e,
Xwezî ezê teyrekî bama ji vanî teyrê di sêfer e,
Dormandorê Silêmaniyê gerî bama hercar ger e,
Xwezî min zanî baya ji lawikê minê xêre yan
þer e.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Çeqilmast

(I)
Kerîm lawo çeqilmast,
Me pez kirî bi heneka,
Em bûn koçerê bi rast.

Kerîm lawo çeqilmast,
Me pez kirî bi heneka,
Em bûn koçerê bi rast.

Mi keyand û min meyand,
Min kir nekir nebû mast,
Min rabû kir çeqilmast.

Kerîm bavê Sultanê,
Te kom vegirtin l' talanê,
Neqla mastê kûçiko,
Giha serê meydanê...

Wan beqalê bajarya,
Qantir ajotin xanê,
Bar avêtin dikanê,
Mast kiribûn tepsika,

Avêtin vê qapanê.

Kerîm lawo çeqilmast,
Pisîkê mexmer alasat,
Me pez kirî bi heneka,
Em bûn koçerê bi rast.

Sê bizinên kûçik hene,
Xelkê kehrê (ke'rê) xwe dan kir,
Û xelkê pezê xwe êm kir,
Ew zelamê çû çi kir,
Eba mezin li xwe kir,
D'ser bizna re sekinî,
Stoyê xwe j'ebê zeyde kir.

Binya mala me b'kevir,
Xelkê karê (ke'rê) xwe dan kir,
Xelkê pezê xwe êm kir,
Sê karê teres hebûn,
J'her siyan yek nas nekir.

J' qapaniya dinyayê,
Çû eba mezin l'xwe kir,
Sê bihûst û çar tiliya,
Stoy' xwe j'ebê dirêj kir.

Hat cihaba (cewaba) nexêrê,
Gura bizn'a beþik kuþt,
Biz'na gerdik brîndar,

Bez’na belik va li mal.

Hat cewaba nexêrê,
Eliyê Remo Edla bir,
Hengî teres bihecî,
Go zîk û da xencerê,
Bi êgir ket û bela kir,
Go: Em b’dest lepkî bi wan nikanin,
Hêvî Xwedê û Þêxê Gir.

Dor tixwîbê (tixûbê) bi xiþxiþk,
T’li Fatima çîm guhiþk,
Ew dimeþe weke miþk,
Meþa wê, meþa dûpiþk,
Zarowa bi ser de....fiþkefiþk.

Go: Bi Xwedê em naxwin nanê hiþk,
J’dewsa nan û pîvazê,
Em bixwin qaymaq û nivîþk.

Edla û Remî bûne cot,
Herdu çûn Dêra Zorê,
Edla xwe nivîsî rehbik (rahib),
Remo xwe nivîsî pirot,
Go: Hesebkî me mast nefrot.

(II)
Me pez kirî-j’ Qelendera,
Hey kûçik lawê qeþmera,

L’ser sînca Remo binêr,
L’elbika û l’ mexmera.

Remo cîranê Receb,
Gerya bû l’ Þam û l’ Heleb,
Peyda kir sê biznê celeb,
Kumê xwe kiribû merkeb,
Ji bo xatirê pisîka,
Go: nexwin mastê wek kezeb,
Derpiyê j’na xwe qetand,
Kir parzûna þîr û rûn.

Gû bi riha xwe kir,
Çeqilmastê geniyê,
Xist elbika dariyê,
Avêt Midyata rengiyê,
Weqî daye bi çerxiyê,
Kirî cawê riziyê,
Li bejna xwe kiriyê..

Kerîm lawo çeqilmast,
Hat cewaba nexeyrê,
Biz’na reþik va li mal,
Eva qirik gura xwar,
Eva beþik brîndar.

Edla, Remo bûne cot,
Çûn dêra Zehferanê,
Edlê xwe n’vîsî rehbik,

Remo xwe nivîst pirot,
Hesêb me rûn nefirot.

Hingî Kerîm beicî,
Go: Zîko da xencerê,
L'tirafê xist û bela kir,
Her piçikê, b' derkê dibir,
Hawara me ma Þêxê Kur (Gir).

Xelkê bizinên me bir,
Kerîm lawo çeqilmast,
Te konê çarde stûnî,
Te l' erdê xist û guhast,
Tu bû koçerê bi rast,
Te serê til'ya xwe nalast.

Kerîm lawo çeqilmast,
Tu ger'ya l' Þam û Heleb,
Te anî sê bizin celeb,
Yeke kwîr (kûr) û yek seqet.

Kerîm lawê qeþmera,
Pez kirîj' Qelendera,
Kerîm lawo çeqilmast,
Pisîkê mexmer alast,
Me pez kirî bi heneka,
Em bûn koçerê bi rast.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Dankutan

Hey yal-la, ya-la,
Yek wê hayê, li nav rezayê,
Kil û mirêk li ser çogayê,
Biskê sor berdayê,
Çavê reþin kil didayê,
        kil û mirêk l’ser qabayê (kabayê).
Ez diçûmê, ew reviyayê,
Ez gihamê, mirêk bi carî li erdê dayê.
Cara çara li sundayê û li mandelayê,
Û min nedîyê û min ne bînayê,
Ha û e’lmê min negihayê.
Ev hêlînê qaz û beta,
Hêlîn çê kir çol û weta û li ser h’aleta,
Vê payîzê xew xweþ bûye,
Li paþila van hurmeta,
Ev hêlînê van tîtiya,
Hêlîn çê kir çol û çiya û li ser deviya.
Gelî xorta vê payîzê, berê sibê,

Xew xweþ bûye li paþilê van esmera, van zeriya.
Lê, lê Eyþê, Eyþa Xanê,
T’ bilxur bînê ji hebanê,
Kevçiya bîne j’ kevçîdanê,
Tu rûn lêke ji xîzanê.
Heçî xortên dankutanê,
Bila bixwin, nûþêcanê.
Li pîreka û l’jinebiya û li di hinbera,
Bi quzulkurt û zexferanê,
Çi werîsê girê girê,
Mi avêtê qulpa pirê,
Ez xulama qantircîkê dû qantirê.
Siwarê kerê li ser bênderê,
Çav li derê, wek ê þerê.
Ehmed Kurd e, çi qaf gird e,
Mala Ehmed perê gund e,
Jinka Ehmed çiqas rind e.
Ziqaqa reza bi kelbeþ e,
Ji îro pê ve gelî xorta,
Çilovaniya, êzingvaniya weþê weþ e.
Civana min û xelka delal tata reþ e.
Way ohyayê, çi dilxweþ e,
Hêy yal-lah lêxin þer e,
Tu ne lal, tu ne k’ehr,
Li ber mîkutê xwe binêr e.
Çi ewrî di ser me re,
Sozê mi bi qerara te re,
Lê keçikê çardesalî, hewþa bavê xwe dimalî,
Keçik çûye mal ma xalî.

Ez çûm Kercewzê, sê kanî ne,
Yeke tehl e, yeke þor e û yek þîrîn e.
Xwezî bi dilê wî lawikî,
Navê dosta wî Emînê,
Nav þêrînê, xelkê tehl e û bi min þîrîn e.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Dawidê Dêwid

Lê lê, lê wayê...!
Zerîfa Þêxo ban kir:

Zerîfa Þêx Xelef,
Bira Xwedê dîne,
Mala Xwedê dayê, Hemê Þero malik ne ava be..
Çira di gaziya Dawidê Dêwid bavê E'rebê nayê..
Xwedê dîne mala E'skerê Emîr Xazî,
Firqak e'skerê Husêniya girtine ser mizgeftê,
welatê Þingalê girtine..
Ziyareta Þêx Ebûl-Qasim,
Bi kêra dîn û diyanetê mala me nayê.

Zerîfa Þêxo ban kir:

Zerîfa Þêx Xelef bibêje,
Xwedê dayê H'emê Þero,
Te malik ne ava biya,
çira te li me wakir?

Te pertava dilê dostê me þikand
û dijmin li me þa kir.
Xwedê dîne mala e'skerê Emîr Xazî,
firqak e'skerê Husêniya
girtine ser mizgevtê
welatê þingalê,
Ziyareta Þêx Ebûl-Qasim,
li ber þêxkan û pîra þima kir.
Zerîfa  Þêxo bankir:

Zerîfa Þêx Xelef,
bira roja me hilnehata,
ji hêla Mûsilê, ji wa geliya,
bira þewqa xwe neda Þingala
þewitî,
li giran û
hûrkaniya...
Xwedê dîne mala e'skerê Emîr Xazî,
firqak e'skerê Husêniya,
rakirine fermana
Dawidê Dêwid,
bavê E'rebê,
mezinê E`zîdiya,
mekan li
me herimî, cî li
me qediya..

Zerîfa  Þêxo bankir:

Zerîfa Þêx Xelef bibêje:
Xwedê dayê H’emê Þero malik ne ava biya,
tu li ku ma bû, hetanî vî qasî.
Xwedê dîne, mala zabitan û qumandara,
firqak e’skerê hukûmetê,
girtine ser Dawidê Dêwid,
Kuþtine Dawidê Îso,
xerab kirine bext û wijdanê Emîr Xazî.

Zerîfa Þêxo bankir:
Zerîfa Þêx Xelef guliyê min û te kêm be,
bejna Dawidê Dêwid zirav e,
gula sibatê, bira þîn ne hata,
li Þingala þewitî, li ber tae’tê.

Xwedê dîne, mala zabitan û qumandara,
firqak e’skerê Husêniya xistine,
li Dawidê Dêwid xerab kirine,
bext û wijdanê Hikûmetê.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

# De bese

Ebdilhadî Mihemed

Xerabo !, de bes e,
Malik þewitiyo bes e,
Malik li mîratê (jêma) geriyayo,
Te ez kuþtim, te ez helandim, bes e.
Erê digo Xerabo, bejna min zirav e,
Nava min qendîl e,
Nala (wekî, nola) minarekê, li ser rûka gayê..
Erê digo Xerabo, de bes e,
Malik li mîratê geriyayo, bes e..
Erê Xerabo, tu bûyî teniyê
Serê Kirmanca tu bûyî e'rdê
Cehîlo, tu bûyî zacê Bexdayê,
û qîra Mûsilê..
Tu bûyî þekirê Þamê
Li ser dev û lêvên min heyliyayo...
Ezê te biþûm bi heft qilibên sabûna Reqê,

Ji rûyê min, sêwî (nola) sêlekî, qet pak nabe.
Digo: Xerabo, te ne ez kuþtim
Te ne ez revandim,
Te ez birim mala xala,
Te ez ne h'emandim,
Te ez birim mala apa,
Te ez qewirandim,
Go: te ez birim qoça Diyarbekra þewitîþ
Te ez birim xanê Hesen Paþa..
Nala têla tenbûrê,
Mîna tasa fexfûrê,
Li ber axaler û beglera,
te ez þikandim,
Te ez birim ba serbizêra (serbizêra),
te ez birim ba Ebû I'yona,
te ez h'elandim..
Te ez birim Hirrêna (Heran) þewitî,
Li ser Bîr Þerqê, Li nav lemên þimamika, ez veþartim...
Gidî Xerabo, mi dê li wê meh'elê bankir tirî
li wê meh'elê bang kir tirî,
Mi dawa xwe tije kirî ji genimê ceza kirî,
Mi go: ezê ji delalê xwe re bidim bi tirî..
Çaxa xwediyê tirî, çav li qam û bejna min kirî,
Tereso ji qam derketî bû, dilê wî xewirî
Avê heft çeman ji devê wî teresî herikî, bihûrî...

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Delal

Delalo, Delalo, Delal !...
De rabe, e’mrê dilê min bi kulî,
Sebrê dilê min bê te nayê, delalo!
Delalî, delalî, delal...
Yarê delal! suwarêd me suwar bûne,
Berê xwe dane rakê (1) rojhilatê..
Pêþiya suwara danî bû girekê li sirta de..
Xwezî ji xêr û miradê Xwedê re,
Ezê bibûma baqekî gulan û rêhana,
Ketibama destê lawikê xwe de..
Da bi rojê sê cara keftibama xala,
          bihna qeftê di simbêlê reþ de..
Delal! destê min berde..
Kolanê di gundê me teng û tarî ne,
Xelkê di vî zemanî  Þeytan û awên (2) in.
Bi hinceta sêl û agirî dê  ên (bên),
                    ser h’alê di min û te de..

Delalê! delal!..
De rabe, e’mrê dilê min bi kulî,
Sebrê dilê min bê te naye, delalo!..

Delalyê malê di xewa þêrîn de ezê dil nadim,
Delalyê malê ji xewa þêrîn rakim.
Ezê herim sûka Diyarbekra (3) þewitî,
E’bayekî sor î Besrawî ji kenarî delalî malê bikirrim,
li mila kim.
Delal!...
De rabe, e’mrê dilê min bi kulî.
Sebrê dilê min bê te nayê, delalo!...
Delal !...
Herçî cuhabekî (bersiveke) yê xêrê,
Jin enarî delalî malê ji min bît.
Ezê bidimê zêr û zîvê û malê dinê.
Heger pê qaîl nabit,
Sed û bîst aþê di mala babê min hene,
Ezê bidimê ciwanika li ber mehînê,
Delalo! delalo! delal!...
De rabe, e’mrê dilê min bi kulî.
Sebrê dilê min bê te nayê, delalo!...

----------------------------------------

(1) Rak: berî, îttîcah.
(2) Awan, Awên: xayîn û xedirkar, mîna Beko yê Ewan.
(3) Diyarbekir navekî e’rebî bo derdor a Amedê û gund ên wê bû, ew nav ji aliyê Ereban ve hatibû lêkirin.

Piþt re Amed bûye Diyarbekir.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Delal

Delal !...
E’mrê min borî û terka min dana,
Jinikê di gundê me, di hîlebaz in, henekar in,
û hemî roj ser canê min û te diborin.

Kurik dibêjit:
-Erê, keçikê, dînê, tora dibin tora;
Ezê hingê terk a te dan im heta mirêt (mirî yêd)
me,
serê xwe rakin
þax î gihora,

Heylo! delal!
- Kuriko dîno, her wa ye, û her wa nîne,
Dayka  xwe bikuje, qetil nîne,
ev canê ji cana, xwe re birevîne..

Heylo! delal!

Kurik dibêjit:

Erê keçikê dînê, ez dayka  xwe nakujim,
û xwe qatîl nakim.
Tu bibî gulekî Mih’emmedî, te bihn nakim,
Tu bibî hûrîya bihuþtê, te mehir nakim.

Heylo! delal!..

Cana te li ser vî canî,
û bejna te stûr e,
Min wê înayî hembera vî danî,
memkê te dirêj in, ne qola ne..
Min wê înayî Reþgûnê, di h’erama vî baranî,
Nizanim bihna wan xweþtir e,
yan bihna kevna vî kurtanî..

Heylo! delal!..

-Tu kurtikî, û bilind nabî,
û tu stûrî, û zirav nabî,
û tu reþî, û sipî nabî..
-Ez kurtik im, û bilind nabim,
ez stûr im, û zirav nabim,
þaniya lawikê çepel nabim..

-Were, were, were, þînî,
Qapî (derî) biþkê, were çînî,
sing û memik ji qabil te ne,
þeqlê (xitim) mîrî tu ne þkênî..

Rêka gelî, rêka me ye,
tirî ya Zaxo balate ye,
Qewlê min û lawikê delal,
ev heyve li ser me ye..

- Were, were, were zî (zû) ye,
cotê zermemka da bû lawikê delal û na
razî ye,
çavê lawikê delal ji bin ve, li þûla
dî ye..

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Delalê çiyayê Mazî (*)

Keçkê gundê me hemû kerasî bela kin,
Ezê hemûwa komkim ti xanîka mala bavê xwe kim,
Derî bigrim, kullak û þibaka al’ va (a li va) vekim,
Yeg (1) didu ji xwe ra bineqînim, ê dîtir li hogir û hevala beh er vekim (2)
Dirêjê bejna te zirave, weke minara Mêrdînê (3),
Memkê (4) te mînara sêvê, (5) dexlê gurîne,
Çavê te reþî-belek,
mînara (mînana) þimamokê (6) gerxarîne,

Sînga te mînara (mînana) penîrê koçera,
merhof (merov) bêxê, Feremezîne (7)
ji canê xwe re bikþîne.
Þeva bimîn (8) þeva,
li ber derîka mala bavê min,
dibore bazirgan û qantir û deve,
Bibe sêvek xelatî di paþilê min bikeve,
Ezê paþilka xwe pi ser (9) te da bidim hev e,
Heke gundî, malî, gotin ev çiye ?
ezê bêjim derdê mehbûbatê ev e.
Þeva reþa tarî, net (ne di) ferîke, ne dibarî,
Ber derîkê mala bavê min bihort,
me dest davêt memkê çardehsalî,
nikarê xwe bidê vî yalî û vî yalî.

Ser xanîkê mala bavê min meyzeke,
heke kesik (10) tu nîne, vi ra derî veke,
Sêng (11) û berê min (12) bi mufta ke,
Sênga min ber qebalê canê xwe ke,
Lo lo delal ! ber derîkê (13) mala bavê min
zivirî,
Dîhnê xwe da qîzê gundî mînana ordeka ji golê
(14)
serê
subê firî,
Destê xwe bêxe sêng û berê min,
mînana cuwanîka (15) li tewlê tîmarkirî...

-------------------------------------------------------

(*) Binêr Prym û Socin.

Têbînî:

(1) yek (2) parvekim (3) Mardîn (4) Memka (5) Sêva (6) Þim (7) farê (8) bi mi

(9) Bi ser (10) kes (11) Sîng (12) Evdalê Xwedê (13) derîka (14) Golê (bê ji)

(15) Mehîna ciwan.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

# Delalê Qerej-Daxê (1)

Ebdilhadî Mihemed

Were delal berriya Mila berryake dûz e,
Pozê Kêl û Mamdellê bi ser da mêl û xûz e,
Sala çûnî vî çaxa,
ramîsanê bejna zirav,
li cem min mift û belaþ bûn,
sala îsal ji bextê mi ra,
bûye zêt ê Alîdûz e,
Were delal, dilê mi kelekelî...
Birek karê xezala,
hilkiþiyane pozê cûrê (jorê) Ebo Þexatê
xopan,
pozê Tugêl hilkiþiyane fêzan û
mexela.

Ez li bejna xelkê delal dinêrim,
nava þên yê me þewitî,

nala (nola) meþa qitikê,
fesala Xezalê, kêsima kewa
gozel e.
Were delal,
mi li diyara li diyarê qolî babê,
Vêsê li odeka bavê Meysê,
tê dengê pêxasa,
welînê lawê bava,
qîrîna goþtê kebabê.
Ez terka bejna zirav,
xelkê têlî nakim,
hetanî xwê (xoyê) þîn ne be,
qantir nezê,
gawur
najo ser Islamê.
Were delal,
ez bi pozê Mamdella þewitî ketim,
berfê lê
kir.
Were delal,
mi dî Xezal meþiya,
karê li pê,
çîxir (çixir)
çêkir.
Wexta lawkê mi çû welatê xerîb û xurbetê,
Ez nizanim, te di pê xwe ra,
tem ya mi, kara xezala li kê kir.
Were delal,
mala delalê dilê mi,

dike bar ke,
Mi go: gundîno! malîno! rihsipîno!
ji bo Xwedê be, destê mi bi hreview ke,
sûnda qesem li bedena mi be.

Hûn destê mi nekin hreview,
ezê xwe, li þûna warê delalê dilê xwe,
di axa sar
kim.
Were delal,
mi li diyara li diyarê Axwêranê,
mi dî berfê da bû ser baranê,
mi ji Wêranþara þewitî hetanî mîrata Til
Goranê.

Xwedêwo! tu mirazê hreview û kardaþa gîþan
bike,
bira bibe miradê min û xelkê
delal,
her çar
rokê remezanê.
Were delal,
were delal bira xwezî tim û tim, havîn ba,
bira ciyê min û bejna zirav
Qerej-Daxa þewitî,
Mêrgemîra jorîn ba,
Bira ciyê raxa me erd ba,
ser axa me e’baka delêl, þalîn ba,
bira pirêzkê berfê,

zîpikê bihata bi
du weqiya.

Were delal, mi li diyara,
li diyarê Tewrêzê,
pezê bavê Nezîr,
li textê Mamdelê
ketiye þîs û rêzê,
ez
terka
xelkê
delal
nakim,
h
e
t
a
n
î

I
s
l
a
m

n
a
j

o

s
e
r

P
a
r
ê
z
ê
.

Were delal, bi Qerej-Dax a þewitî ketim,
lawika bi
hereme,
Mi ji Mêrgemîra þewitî hetanî bi kura E’ceme,
Ez ne xweþim, lawika tu were ser me.

Were delal, kaniya gundê me bi nît e,
þarûr û bilbila tê da wîtewît e.
Sala çûnî vî çaxa,
ramîsanê bejna zirav,
li cem mi belaþ bû,
sala îsal ji bextê min û te ra,
bi biþkok û bi
kilît e.
Were delal, ez çûm Diyarbekra xopan,

orte bi gol e,
durrbedenê, hatim Qerejdaxa
þewitî,
Textê Mamdellê, temam cîw û meqamê min te ne.
Tu were destê xwe di nabêna destê mi ke,
emê hevdu birevînin,
xwe berdin welatê
xerîb û xurbetê,
dawiya
me Xazî
E’ntebe,
pêþ
iya me
Germiyan
û Edene.

-----------------------------------------------
(1) Binêr: Roja Nû (1943-1946) Beyrût- Lubnan.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Ha wer delal

Ha wer delal,
Kela min bi kela,
Mi dabû germa havînê,
Mi dî bû sê cotê çiyayê Þingalê,
û çongê xwe dabûn mexela,
Bavê min kale û diya min pîre,
Delalkê malê,
Þekirê nava destmalê,
Di ser vê qubalê,
Mewijê Hebabê û bestîqê Çermikê,
Hejîrê çiyayê Þingalê,
Êmiþê dora Keþmilê, xopana Qibalê,
Gewrê tirsim bimirim tu sebebî,
Tirba min bikolê, li hewþa mala bavê te bî,
Bigire destik avê li qebra mi xe,
Bêjê sed car rehmet li gora dê û bavê te bî..
Destmal sorî, pêþmal þînî,
Daw bi gulî,
Hey lê wayê!..
Ez bi tenê îþev mêvanê te me,
Ez xilxala lingê te me,
û heyrana bejna te me,
Mêrê te, çûbû eskeriyê,
Wez wekîlê mala te me..

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Derdo

Derdo, derdo...!
Mi dî stêra sibehê li me zer da, mi dî li me þîn kir,
Gihayê çolê, nebatê hemû e’rda.
Mi dî þevê çûyî bavê min sêwlekê,
Di bazara min û te xeber da..
Derdo, derdo...!
Ev sibe ye, ez qîmi nakim,
Begê zirav ji xewa þêrîn rakim,
Ezê misîn hilînim, avê li desta kim,
Ezê bi guhê lihêfê bigirim,
Bi ser mîrê zirav dakim,
Du qam ferza nimêja sibehê li begê min çûne,
Ezê rabim ji dêl mîrê xwe ve bi qeza kim.
Derdo, derdo...!
Derdo h’eyran, mi dî li me derketî stêra zer e,
Mi dî pêwir û mêzînê li ezmanê hefta xudan ber e,
Kuro! mij’ te re nego,
zimanê te qelem e, singa min defter e,

Serê sibehê, mînakî melayê diwanzde a’lim,
tu dixwînî li ezber e.
Sing û berê min yetama Xwedê,
mînayî payetextê mîrê Kurdistanê,
salê diwanzde meh,
Þer û qewxeyê diwanzde dewletên ejnebî li ser e.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Derwêþê Evdî (*)

“Dengbêj Ehmed Zenel li Kurdistana Turkiyê, bajarê Wanê, nehya Çaldîranê, qeza Muradiyê, xelkê gundê Girê Sora, rûniþtiyê gundê Sawox Soyê.
-Kovara Sirwe, hejmar 35 -

Ay lê yar dê..
Wey.. Lê yar dê..
Dilêm li yane, lo lo dilêm li yan e..
Sed car dilêm li yan e..
Serê dilê mi bi kul û derd û bi kovan e,
Gidî binê dilê mi bi dûman e,
Bi salixê salixdara dibên Seîd û Telhan du biran e,
Seîd birê mezine, birê biçûk jî Telhan e,
Birano! Du fîdanin rebbê mutee’la yê bi xwe dizan e,
Zeman zemanê bê bavan e,
Heyam heyamê bed eslan e,
Dibê geleka pîlanê hindakirina herdu zilama,

ji xwe ra qirar dane,
Seîd digo Telhano bira ! Welatê hanê welatê nan-erzan e,
Rabe emê biken tedarekê kerwan e,
Emê berê xwe biden hîmê binê berriyê,
çend sala herne kerwan e,
Xwedê heyanî belayetê rêç dike ji devê musilmana,
yaxa me xilas dibe ji pîsan e..
Dayê..hay....
Hey yar dê dilê mi li yan e,
sed car dilê mi li yan e..
Serê dilê mi bi kul e,
Binê dilê mi bi kul e,
Binê dilê mi bi dûman e..
Seîd û Telhan herduya ji hev ra qirar dane,
Herdu bira berê xwe dane hîmê binê berriyê,
xwe ra çûne bi kewran e,
Heft roja hajotin bi rê da ne,
Law rêka dûr û deraz e,
Ne bi gotin û xeberdanê cemae'tê di giran e,
Roj kete roja di heþtan e,
Dîna xwe didanê rastekî rast usan e,
Yeqîn dikim xîz li çokê hespan e,
Jê ra dibên hîmê binê berriyê, ciyê hût û lehengan e,
Mêrkê camêr nebîne derdê bê derman e,
Li hîmê binê berriyê her kesek nasekine li ber alavê mêran e,

Hertim û cara li wê mihîtê ret nabin dengê riman e,
Her kesek îro nahejîne qedrê riman e,
Herdu bira didanê êlekê giran daniye,
li serê rast û di bestan e, xeyo! (bira!)..
Hey lê yar dê.. wey lo .. lo.. wa...
Dilê mi li yan e, sed car dilê mi li yan e,
Serê dilê mi bi kul e,
Binê dilê mi bi dûman e..
Ew herdu zilam meþiyane nava êla giran e,
Dîna xwe danê konekî li ser bîst û çar ustûnan e,
Heft perde li kon da girêdan e,
Kula Xwedê bi kon bikeve, mala bavê xweyê konê di giran e,
Ez we ra yeko yeko bidim salixê perdê di konan e,
Birano! Perda yekê cihê rûniþtina mêran û hût û lehengan e,
Perda duyê cihê rûniþtina xanima û cankan e,
Perda sêyê cihê kebanî û serkarê di malan e,
Perda pêncê cihê tevinkira, dikin neqþ û nimoþan e,
Perda þeþê hoza miyan e,
Perda heftê koza berxa,
Li piþt perdê da cihê tewla mee'negiyan e,
Dîna xwe didimê qîz û bûkê Kîkan û Milan,
rûniþtine li bin perê konan e,
Zendê bi helî morî hildane,
Gidî çawa rûdinin du kevrê loqloq û antîqe, pêda

bi dar dane,
Ne havetê eletirîk û þemdan û çiran e,
Qîz û bûkê Mila tim û tim û caran,
li ber dikin þe’r û nemoþan e,
Bidim salixê konê di giran e..

Wêl wêl wêl....
Ay lê yar dê..wî...
Lo lo lo dilê mi li yane,
Xeyo! Serê dilê mi bi kul e,
Binê dilê mi bi dûman e..
Wa zilama dîna xwe didane rûniþtina cemae’ta di mêran e,
Dîna xwe didane dar cixarê destê wan, sê bohst û sê tiliyan e,
Wa zilama îro cixara avêtine ser kokê qelûnan e,
Dû ji devê hev direvînin, mala we þewitîyo!,
Nola boriyê di soban e,
Dîna xwe didinê kulkê serê wan sê bohst û sê hoqan e,
Pêçê serê wan hemû reþiyê þee’rê Diyarbekir,
jor da ber eniya da
berdane,
Li milê wan dinêrin e’bayê Hezoyî sê bohst û sê ritlan e,
Li nigê wan dinêrin reþkin, mala we þewitîyo!,
Temam rûniþtine bi hev ra ketine diþmîþê di giran e,
Kulka xwe dane orta îmanê bir û bijangan e,

Seîd digo: Telhano bira!
Eve heþt roje em ketine serê rê û dirban e,
Me kiriye bîra xamê di mangan e,
Hey mala te þewitîyo!
Ji birçîya qidomê me çûye herê taqetê me neman e,
Li nigê me nagire rikêbê zengiyan e,
Destê me nagire desgiriyê mee’negiyan e,
Malþewitîyo! Em birçî, yamane serê rê û dirban e,
Bajo derê konê hane,
Em bixun qote nan e,
Li memleketê me bûye axir dewran e,
Yeqîn dikim niha çor û çocixê me birçiya,
xwe dane ber dîwaran e,
Wêl, wêl...Ay lê yar dê....
Xeyo! Dilê mi li yan e,
Sed car dilê mi li yan e,
Serê dilê mi kul e,
Binê dilê mi bi dûman e...

Herdu bira hajotin derê konê di giran e,
Dîna xwe didanê,
Kiþyaye pêþiya wan sêsed mêrê xweyî kulk û e’ban e,
Van qilçikê e’rebî li ser enîþka da vedane,
Jor da meþiyane li ser siniyan e,
Dixun birincê Qere Çamê dûvê helkan e,
Milê wan zilama heta enîþkê di duhn û rûn da

man e,
Qet kesekî negot ew herdu zilamê hanê, ser piþtê hespa man e,
Lawo! Derbas bin ji boyî Xwedê bixun qotek nan e,
Seîd çav kire Telhan e,
Go: Eva kona konê namdaran e,
Bajo em derbas bin serê konan e,
Lawo! Nadine me qotek nan e?!
Ew zilamê hanê xweyî kulk û þee’r û e’ban e,
Me ji xwe ra nagrin seysê hespa, na welleh ji êlê ra golikwan e,
Lawo! Bajo em herin serê konan e,
Em xerîbin nadine me qotek nan e,

Wêl, wêl, wêl...
Ay lê yar dê...
Lo lo lo...dilê mi li yan e,
Sed car dilê mi li yan e,
Serê dilê mi kul e,
Gidî binê dilê mi bi mij û dûman e..
Gava ku van zilama hev ra xeberdan e,
Vegerandin serê hespan, medee’nê mee’negiyan e,
Derbas bûn serê konan e,
Menzîlekê ajotin, menzîlekê di giran e,
Dîna xwe didanê îro konekî tek vegirtiye dorê konan e,
Konê vî zilamî li ser heft stûnan e,

Belê perdê kon rîþiyêd hevirmoþin, peng bi peng bi hev da ne,
Kalekê nûranî rûyê wî sipî ye li ser çokan e,
Diran di dêv da nemane,
Hey lawo! îro þaþkekî li sêriye,
tizbiyekî sed û yek lib di dêst da ne,
Li ser postekî nimêjê rûniþtiye,
ji xwe ra dikþîne selewat û wirdan e,
Seîd digot: Telhano bira! Bajo derê konê hane,
Ewa konê hanê yeqîn dikim tertîla wî bisulman e,
Wa herdu zilama ho kirin deve û mîratê qantiran e,
Ajotin derê konê di giran e,
Ew kalê nûranî ji ber wan rabû ser piyan e,
Gidî girtiye serê hespan e,
Çehv kire nav malê weqa we çiyan e,
Go lo lawo! bigre bi serê hespan e,
Cil û ciholê ser piþtê heywanan jê biken, bavêne perê konan e,
Hevsarê serê heywana biþiqitînin, bavêjin hêsiyê konan e,
Wa heywanan berde serê rast û bestan e,
Hema zivirî li nav kon da, belê doþekeke qoþtokê avête erdê,
Belgiyê bi sê legan li ber piþta wan e,
Ew kalê nûranî sekiniye li pêþbera kon,
li pêþiya zilama dike hurmeta giran e,

Seîd ban kirê, go: Apo ! rûyê te sipî ye li ser çokan e,
Paþê te derbas bûye tu li ser piya sekinî, dikî xizmeta giran e,
Erê dibê ji me ra ne baþe, ne þerefa mêran e,
Lawo! îþê we tune bi xeberê hane,
Hûn xerîbin, ne ji van deran e,
Hurmeta mêvan tim û tim û caran ji bona Xudan e..
Ay lê yar dê...
Wêl, wêl, wêl....
Lo, lo, lo...dilê mi li yan e,
Serê dilê mi kule, binê dilê mi bi dûman e,
Seîd pirsî, go: Apo! êlekê daniye li serê rast û bestan e,
Konekê giran li ser tacê konan e,
Heyanî pênc hezar mal di bin kona da ne,
Rîþiyê kona peng bi peng bi hev da ne,
Gelo! Ew kona konê kê ye û êla çi kesan e?
Go: Lawo! ew êla ku tu dibêjî, êla axayê mîrê Milan e,
Go: Apo! li êla wî da qerebalixek hebû,
ew çi qerebalixeka di giran e,
Go: Lawo! Ma tu nizanî? Ew kona konê mîrê Milan e,
Sêsed mêr têda rûniþtine li hundirê konan e,
Her yekê reîsê êlekê li kon da rûniþtine, ji hev ra bi xeberdan e,
Belê go:

Lawo! ji mîrê Mila ra hatiye kaxeza gawirê Çîl Osman e,
Go: Apo! Sebebê wê çî ye û çiman e?
Go: Tê da nivîsiye; yê bide min hozê miya, kozê berxan e,
Yê bide mi da barê zêra, qenterê devan e,
Yê bide mi da xerac, xeml û rewþa konê erebî,
cehniya meî'na leylan
e,
Yan jî yê sorguliyê E'dola qîza xwe ra bigre,
ji me ra têxe kebaniya mala giran e,
Ê go: Apo! Sebebê wê çiye û çiman e?
Go: Gawire..jê ra dike xeberdanê di giran e,
Ê go: Apo! Lê tu kî yî?
Navê te çiye û te çima hatek daniye? û tu naçî nava wan e?
Ay lê yar dê...
Wêl, wêl, wêl....
Lo, lo, lo...dilê mi li yan e,
Serê dilê mi kule, binê dilê mi bi dûman e,
Lawo! U'mrê mi derbas bûye, hatiye nod û nehane,
Tu bala xwe bidê diran di devê mi da nemane,
Rûyê mi sipî ye, li ser çokan e,
Lawo! Çokî mi ne yê doþekan e,
Tilî pêçkê mi ne yê birincê Qere Çamê, dûvê helkan e,
Lêvê mi ne lêvê qehwan e,

Navê mi Þêx E'vdî ye, ez bavê Derwêþim
Belê e'mrê mi derbas bûye ji nod û nehan e,
Seîd jê pirsî, go: Apo! Tu dibêjî ez Þêx E'vdî me,
Bavê Derwêþim, lê Derwêþ kuye û Kê derê dane?
Mi nav û dengê Derwêþ bihîstiye li welatê þerqê,
Li nava hevdê di tevnane, li cemae'tê di giran e,
Axa û beg li wir da li hev dicivin, dikin neqlê û xeberdan e,
Dikin behsa herba Derwêþê E'vdî, herba di giran e,
Îca (îcar) niha Derwêþ kanê? Li kê derê dane,
Ay lê yar dê...

Wêl, wêl, wêl....
Lo, lo, lo...dilê mi li yan e,
Serê dilê mi kule, binê dilê mi bi dûman e,
Lawo! E'detê mala me ye, gava bikevin xewa di giran e,
Heft roja ranabin li xewa di giran e,
Îro belê çare Derwêþ raza ye, hê sê roj wexta rabûna wî jî mane,
Lawo! Em jî qehrîne, naçine nava êla wan e,
Lê belê ez ji we ra bikem salixan e,
Îsal heft sale, dilê Derwêþ li E'dola qîza mîrê Mila dane,
Ez diçime xazginiyê E'dolê,

ji me ra dibêjin eslê te Êzdî ye, pîrê te
Þeytan e,
Îro ketiye roja kewkebê sibê, nerîniyê lawê di bavan e,
Ku ro tê dengê kose û Misriyan e,
Lê belê ewî jî giregire, top kiriye nava konê xwe dane,
Dibê: Hatiye ji me ra nama Çîl Osman e,
Lawo! Ewî jî îskana þertan û þortan daniye ser zerfan e,
zerfe li ser
telban e,
Telbe li nava cemae'ta mêran e,
Kî yê ku here bîne cewaba eskerê Çîl Osman e,
Ezê bi sorguliyê E'dolê bigrim,
Jê ra bikeme kebaniya mala di giran e,
Lawo! Îro heft roje, birincê Qere Çamê,
dûvê helkan dide wan, xweyê kulk û e'ban
e,
Kes newêre destê xwe bavêje îskana þertan û þortan e,
Îca (îcar) li pêþiya xwe bi darekê cixara hildan e,
Çokekê li pêþiya xwe erd vedane,
Em jî xeyidîne, naçine nava wan e,
Rûyê wî jî nagire biþîne pêyê Derwêþ dane,
Lawo! Ewa cemae'ta wî îro heft roje, li kon da hev civiyan e,

Wêl...ay lê yar dê...

Wêl, wêl, wêl....
Lo, lo, lo...dilê mi li yan e,
Serê dilê mi kule, Xeyo! binê dilê mi bi dûman e,
Gotin di devê Þêx Evdî da bû,
Goo: Apo ! Xazlî min bidîta qed û qametê Derwêþ,
ku çawa salix dane, gelo!
veryan wisan e,
Þêx Evdî rabû lingê xwe lêda, li serê papoþan e,
Çû derê çadora Derwêþ yê jê ra bêje du bendan e,
Ciga gotinê Þêx Evdî ji ewlad raçan e:

Wêl, wêl, wêl...
Digotî de lo lo...wayê..
Hoy...wî......
Der rabe hûto ! rabe.. Lehengo! rabe..
Soteniyo ! de rabe.. Poþmano! de rabe..
Pênc perano! de rabe..
Derwêþo! Lawo! rabe ji xewa di giran e,
Du zilam hatine mala me mêvan e,
Xerîbin ne ji êlê ne, ne ji e'mrê ne,
Çol û best dane pêþiya xwe dane,
Yê herin hîmê binê berriyê kerwan e,
Salixê te jê ra dane,
Lawo! de rabe devê me da nemane dirane,
Ne wextê min wî lagirdî û henekan e,
Îca rabe ji herdu mêvana ra bike laqirdiyan e,

Bila li memleketê me nekin tu xem û xiyalan e,
Ay de yar dê, rebenê! dilê mi li yan e..
Mi dîna xwe didayê Derwêþê Evdî, radibû ji xewa di giran e,
Xulama girtine qulpê misîn û leganan e,
Pêþgîrî li ser milê wane, li ber Derwêþ sekinîne,
Derwêþ avê davêje nava birû û bijangan e,
Þêx Evdî hatiye li kêleka herdu zilama rûniþtiye,
Ji wan dike laqirdiyan e,
Ay de yar dê, rebenê! Dilê mi li yane, Dilê mi li yan e..
Mi dîna xwe didayê Derwêþê Þêx Evdî,
Siyarî Hedman, kilê çehvê qîzan û bûkan,
xwe berda bû perê konan e,
Sê cara tewafa destê bavê xwe kiriye,
Li pêþdera kon herdu destê xwe kemer best girêdaye,
sekiniye ser piyan e,
Wêl, wêl, wêl....
Ay de yar, dê, rebenê! Dilê mi li yan e..
Þêx Evdî ziviri li ser milê xwe nihêrî li mêwanan e,
Digo:Lawo! Mêwan! Ev herdu zilaman e,
Rûne kêleka wan e,
Ji wan ra bike hurmeta di giran e,

Wêl, wêl, wêl...
De yar dê, dilê mi li yan e..
Seîd û Telhan herduya dîna xwe dane,

Qed û qamet û bejn û balê Derwêþ dane,
Texmîn dikir teþbîh nebe, bejna wî wekî minareyê camiyan e,
Çokê wî wekî çokê neran e,
Bînanî nerê, ku têkeve pêþiya heft qenter devê di kerwan e,
Nehtika wî sê bihost û çar tiliyan e,
Ez dîna xwe didemê orta herdu birû û bijangan e,
Du moyê Ezraîl dor va pêþxweyan e,

Dayê wêl wêl...
Ax de dibê çawa salixan e,
Seîd bi Telhan va dîna xwe didanê wisan e,
Haza ku mêrkê bi sed mêran e,
Gava ku bikeve þerê hîmê binê berriyê leheng û hûtan e,
Bi qebzê rima rabigre rikêf ke (bike) nava mêran e,
Minê dîn û bala xwe didayê, îro çu bibe nirniya lawê bavan e,
Kula Xwedê bi kul be, bikevê mala xweyê Hedman e,
Gava bikeve þerî pelewan û hûtan e,
Devê xwe davêje qaltaxê zînê hespê dijmina, dikiþîne ser xweyê xudan e,
Lo, lo, lo....
Belê para dide ber refsan û çiftan e,
Îca pêra dide ber lekman û gezan e,

Mîratê Hedman nehlê wî zîvin, bizmarê zêr lê dane,
Bi rojê kewkewê giran, berniyê lawê bava ra,
Bi dengê gozel û Misriya ra, tim û cara li serê meydanê,
Mecalê nade dijminan e,
Lo, lo, lo.... Macalê nade dijminan e...
Lo, lo, lo.... Hey lê yar dê ! rebenê! Dilê mi li yan e..
Gotin di devê wan zilaman e,
Dîna xwe didanê siyarekî tek derketî li perê konan e,
Rimeke Nezarî li dêst dane,
Heft salixê rimê heye, ez ji we ra bidem salixê rima hane,
ka
çawan e..
Yel lale, yek dûre, yek qumrûte, yek zumrût e,
Di ortê da yaqûta teyrê di Nu'man e,
Serê mîrata rimê li hewane, sade ji jehriya mee'ran e..
Wisane bînanî gewrekî asin lawo!
Beraþ bi mûkî pêda bi dardan e..
Belê medhanî yek li bindan e,
Ew hespane wek hespê welatê Serhedê notla bergîrê hane,
Bi linga têne firotan e,
Her lingekî heywanî tê bi çil kîse zêrê di giran e,
Lo, lo, lo.....

Ay yar dê !, dilê mi li yan e,
Evî zilamî ajote derê konê Evdî dane,
Þêx Evdî û Derwêþ rabûne ser pêyan e,
Bi serê Medhaniyê ragirtin,
Derbas kirin piþt çît û ser doþeka hane,
Wexta ku ew zilama rûniþt li ser doþekan e,
Go: Lawo! Eva jî navê Cee'ferê Gêsan e,
Kurê xûþka min e, riya heft qonaxa ji me wê da
ne,
Gava bikeve þerî leheng û hûtan e,
Ancax Derwêþ digere serê hespan e,
Ew dujmina radikeve laqirdiyan e,

Wêl, wêl, wêl, yar dê !....
Dilê mi li yane, lo, lo, lo....
Wextê ku Þêx Evdî salixê Cee'ferê Gêsan,
bi herdu zilama ra
dane,
Dîna xwe didanê E'rebekî têye ji wê dane,
Lêva E'reb yek li erd e, yek li asîman e,
Nûra Reh'man tune li rûyan e,
Namekî li berîka wî dane,
Selam dabû her çaran e,
Þêx Evdî go: Ereb! Kerem ke ! Derbas be jora
hane..
Ereb li qarþî Þêx Evdî rûniþtiye li ser çokan e,
Destê xwe avêtî namê,
daniye ser çoka Þêx Evdî, bavê Derwêþ
dane,

Wexta name derxistiye dîna xwe daye zerf û kaxezan e,
Seîd go: Apo! Ewa çi nameye? ji me ra bêje, ka çawan e?
Go: Lawo! Eva heye E'rebê maliyê mîrê Milan e
Erê, ji me ra hatiye nama hane,
Dibêje îro heft roje mi berev kiriye giregire,
Xweyî kulk û e'ba, her reîsekî di êlê dane,
Didime wan birincê Qere Çamê, dûvê helikan e,
Milê wan heta enîþkê di dûn û rûn da mane,
Mi îskana þertan û þortan daniye ser zerfan e,
Zerf li ser telbane, talbe li nav cemae'ta di mêran e,
Belê îro çawa heft roje kes newêre destê xwe bavêje
îskana þert û þortan e,
Qe îman û namûs ji me ra nemane,
Belê îro ji me ra hatiye nama Çîl Osman e,
Tê da nivîsiye yan bide min hozê miya, kozê di berxan e,
barê zêra, qenterê
devan e,
Rewþa konê erebî, cehniya mîna leylan e,
Yan jî yê sorguliyê Edolê ra bigre,
ji mi ra bike kebaniya mala di giran e,
Ax de lawo! Namûsa mêrkê busilman ne bi peran e,
Dibê û cam îskan daniye ser zerfan e,
Sefer ! Here bîne ji mi ra cihaba (cewaba) eskerê

Çîl Osman e,
Kê here bîne cewaba eskerê Çîl Osman e?,
Erê bi gotina Xwedê bi hedîsa pêximber,
Edolê jê ra bikem kebaniya mala di giran e,
Lê kesek avrê “awrê” xwe nade îskana þertan û þortan e,
Ewa nema hanê haniye ji mi ra ne..
Dibê bila kerem bike were cemae’ta di mêran e,
Lê mi beriya nihe ji we ra got; em jî qehrîne,
naçine cemae’ta wan e,
Mi wextekî dee’wa Edolê dikir ji Derwêþ ra ne,
Ji mi ra digot qîmeta te çiye, ez eþîrim,
eslê te Êzdiye, pîrê te Þeytan e..
Ay lo berxê ! Dilê mi li yan e,
Sed car dilê mi li yan e..
Þêx evdî digot: Lawo! Hûn demekî rûnin,
Ez gavekî herim derê konê mîrê Milan e,
Çi kanê çi deme, çi dewrane?
Çi qerebalixe, þêvra (þêwra) di giran e,
Lehzekî mêze bikem bejn û balê xwe danê kulk û e’ban e,
Îcar Þêx Evdî nigê xwe lêdane serê mee’san e,
Çû derê konê axayê mîrê di Milan e,
Dîna xwe dayê xweyî kulk û e’ba rûniþtine,
Pêda pêda belê kulkê xwe kutane,
Orta îmanê birî û bijangan e..
Her yekî þevqelûnê wan di desta da bi du mêtran

e,
Rebena îcar tirsa va ketne diþmîþê di giran e,
Naxun îskana þertan û þortane,
Yeqîn dikim îro her yekê çokekê pêþiya xwe erd vedane,

Xeyo ! Dilê mi li yan e,
Wêl, wêl, wêl...
Îcar Þêx Evdî selamekî dabû xweyî kulk û e’bane,
Axayî mîrê Mila digo Þêx Evdî: Derbas be jora hane,
Þêx Evdî digo: Lawo! Serê te mezin e,
Bînanî serê balaxê gamêþane,
Te hindik gede û gode, golkê li ber çêleka,
Îro heft roje, top kiriye nava cemae’ta giran e,
Lawo! Tu didî wan birincê Qere Çamê, dûvê helkan e,
Te taqet nekir, tu çopek nan bidî wa zilaman e,
Ji boy Xwedê ! rêwîne li serê rêyane,
Îca xweyê kulk û e’ba di don û rûn da mane,
Lawo! Tu dibêjî mi derbas be jora hane,
Ne qûna min ya doþekan e,
Ne tilî pêçekê mi yê birincê Qere Çamê, dûvê helkan e,
Ne lêvê mi lêvê qehwan e..
Go: ez hatime, ka gotina te çiye û dee’weta te çirane,
Go: Çima tu nizanî îro çend roje,

ji mi ra hatiye nama Çîl Osman e,
Belê go: Axayê min! Çendî yaþê mi derbas bûye,
lê guhê min li guhdariyan e,
Axa go: Lawo! Namûs ne ji te ra ne,
Te golikê ber çêleka top kiriye, konê xwe dane,
Heft roje tu jê radikî xizmeta giran e,
Sibê bila bikeve kewkewê þingîniyê,
Zengiyê mîratê methaniyane (pesindar),
Bibe nirrîna mêran e,
Bibe gojînê qurz û kemendan e,
Bibe teqînê rim û Misriyan e,
Ewê serê xwe ber deriya derxin, wekî golikê li ber çêlekan e,
kesek ji te ra nake yardima
namûsa di giran e,
Þêx Evdî serê xwe bilind kir,
Go: Qaweçiyo! Serê mi dêþe, dilê mi dila , dilkî dîne,
Serê dilê mi bi kule, keser û bi birîne,
Îskana qawa (qehwa) þert û þorta,
cemae'ta sêsed mêrî tu birjîne,
Ji apê xwe ra qaweyek teze bikelîne,
Li pêþiya xweyê kulk û e'ba bigerîne,
Bila dilê kesekî ji min nemîne,
Hemîn yaþê mi derbas bûye,
Wextê min û þer û dee'wê giran nîne,
Lawo! û îca tu ber bi apê xwe jê re bîne, tu çi ka çi dewran e,

Bila kulk û e’ba û þee’r û þiyê vana, li bestê bê xweyî bimîne,
Ay lê yar dê !, Dilê mi li yan e,
Lo, lo, lo, dilê mi li yan e
Sed car dilê mi bi kul û derd û tev kovan e,
Binê dilê mi bi dûman e..
Wextê qaweçî îskana þertan û þortan digerîne,
Xweyê kulk û e’ba serê xwe birne binê apinciyan e,
Lawo! Ketne diþmîþê di giran e,
Sira hate ser Þêx Evdî dane,
Þêx Evdî destê xwe avête îskana þertan û þortan e,
Ser xwe da qulband; bû þîrqîna cemae’ta xweyê kulk û e’ba,
h
emî
pê
ken
iya
ne,
Go: Emrê wî nod û nehane, diran di dêv da nemane,
qûna wî naçe ser ciyan e..
Bi laf û lofayê here bîne cihaba eskerê Çîl Osman e,
Temam pêda bi Þêx Evdî keniyane,
Þêx Evdî zivirî, berê xwe da mala xwe dane,
Temam ji Derwêþ ra salix dane..

Dilê mi li yan e,
Sed car dilê mi li yan e,
Lo, lo.....
Çar siwara ajotin derê konê mîrê di Milan e,
Xweyê kulk û e'ba hemiya ustiyê xwe xar kirine,
Çehvê wan mane li hewan e,
Destê wan nagire îskanê qehwan e..
Rebbî ! Derwêþê Evdî sekiniye pêþdera kon dane,
Doþeka wî li milê mîrê Mila dane,
Dakeve binya solan e,
Cehferê Gîsan, Seîd û Telhan rabûn ser doþekan e,
Bi xwe sekinî li qarþê her sê bira li ser çokan e,

Hey de yar dê!..
Derwêþê Evdî gote xweyê kulk û  e'bane,
E'mrê bavê min nod û nehane,
Diran di devê bavê mi da nemane,
Bû þîrqîniya we, hûn bi bavê mi keniyane,
Lawo! Îskana þertan û þortan,
Eva heft roje li ber we ye,
We notla (nola) gulka ustiyê xwe xar kiriye ber dîwaran e,
Îro roja mêrane..

Wêl, wêl, wêl...

Hey yar dê, rebenê !
Gulê tu bi kul bî, bikevî mala bavê Edolê,
Bi sêsed û þêst û þeþ terza xwe xelandiye (xemlandiye),
Zulf berdaye nava gerdenê di biryane,
Bejna vê delalê usane notla taka rihan e,
Ber devê Erezbelê, þivka gezoyê hindavan e,
Sûretê wî horî, melekê bînanî (mînanî) sêvê Xelatê,
ji xwe ra teze xal dane,
Li gerdenê binêre notla gerdena qulingê payîzê,
Bike zarîn li nava çîmen û çapira li perê zeviyan e,
Dilê wî îsal heft sal e li Derwêþ dane,
Di bin bijang û mûjingê çehva ra avirê di Derwêþ dane,
Derwêþ birîndare, firarekî bîst û çar sala bikeve li firariyê,
Gulkê bi nuqte bavêje dil û hindavan e,
Usa vira di Derwêþ belê notla oçaxiyê,
Tîr û kevanê tîrekî bavêje serê kezebê,
Serê kezebê wî kul kiriye, pîlê wî va piþkok dane,
Yar dê ! Dilê mi li yan e...
Derwêþ hindav dara bû ser piyan e,
Rakiriye singê ber hêsiya konan e,
Ketiye nava xweyê kulk û e’bane,
Kulk ketine nav dest û piyane,
E’bayê Hezoyî li erdê lezyane,

Þevqelûnê wan agir va wergeriyane,
Darkê cixara li nav dest û piya da bûne þeþ pitiyane,
Min bala xwe didayê heta sêsed mêrî,
xwe avêtin piþt cil û cihazê di devane..
Ay lê yar, dê !...
Cehferê Gîsan, Seîd û Telhan û Derwêþ,
hatine derê konê Þêx Evdî dane,
Derwêþ digo: Bavo! Ji me ra bike karî hespan e,
Me serê xwe daniye oxra di girane,
Þêx Evdî çû pêþiyê, go: Derwêþo !
Lawo! Navê hespê te Hedman e, yê mi Etman e,
Lawo! Îsall heft sale hundir da tav nedîne ji dewrane,
Ji hiþkiyê da xarina wan e,
Minê nee’lê wan zîv û bizmarê wan zêr lêdan e,
Serbaz û nemehîn li serê meydanê bikevne þerê lehengan,
Xwe bavêne ser dizgînê dijminan e..
Wêl.... dilê mi li yan e,
Sed car dilê mii li yan e,
Þêx Evdî digo: Derwêþo ! Lawo !
Li hespê mi siyar be, belkî li roja tengavî,
tu dikevî þerê kewkewê sipî,
Þerê kose û Misriyan e,
Dengê nirrînê lawê bava, lawo !
Tu bê xayî namînî li nava dijminan e,
Derwêþ digot: Þêx Evdî aqil çûye, sewdal serê te nemaye,

Ez hespê çê siwar bim, yê kotî bime van birayê hane,
Xwedê þuxla mi nayîne li serê rê û dirban e,
Eger ecelê mi hatibe li ser piþta mîratê Hedman e,
Tu hespê xwe bide Seîd,
da Gulîþeyn, dayîka herdu hespa bide
Telhan e,
Ezê jî siyar bim Hedmanî binê beriyê xwe dane oxrê,
Piþta xwe dane feleka xayîn û derewîn ji kesî ra nemane,

Dilê mi li yan e...
Serê dilê mi kule, bi kovan e,
Binê dilê mi mij e, bi dûman e,
Edola qîza Zor Temer paþayê Milî bihîstiye;
Derwêþê here ser Çîl Osman e,
Revê qîz û bûka ser xwe dane,
Þita begê daye bejn û bala xwe morî û înciyan e,
Lawo! Av li gerdenê xweya dike, mêjo li tiliyan e,
Xwe berda bû serê riya, ku Derwêþê here ser Çîl Osman e,
Îca wî çaxî yê Edolê be ezmanê þirîn,
bi qed û qametê giran yê bendekî Derwêþ
ra
bêje kanê bendê wê çawane..?

( mixabin ! Ev stran neçûye serî...)

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

# Diyarê Bilind

Sirta diyarê bilind bê ba nabe, newalê di kûr bê av na be.

Keçikê bi kezî, di vê çax û heyamana me de,

Ji heft salan û pê ve, li mala bavê xwe, bê dostik û bê yar nabe.

Çaxa pehir (pêr) vê çaxê, ez li mala bavê xwe de qîz bûm..

Salan û vê salê, darê dergûþê, li serê min bû, e`mel û kar bû.

Qirika te dirêje, qirika qaz û betê,

Wey li te arê Xwedê di mala bavê ketê, te sê biskê xwe ê þê,

t
e
ber
da
bûn
.

Wek carên ji carê berê, li gora adetê,

Xwezil ji xeyra Xwedê re, minê devê xwe tê

xista,
gaza gerdenê, bozxana
qirikê
Heya ro li min û te bihata qubletê..!
Mi dî çavê te reþ in, ji çavê maran tu yê sê
biskên  xwe ên þê
berda bûn, nala topek
þerîtê, devê xirara.
Awirê vê sibayê ez dikutam, ez dih’elandim.
Mîna yê topekê ji topên Diyarbekir,
Tu hevale bikî, ser derê dijminan.
Xwedê hebîne tu ramûsankê bide min,
Ji xan û manê gerdenê, ji boxaza qirikê.
Ne wela.. ji bin ya cotê guhara,
Te taqê sipî, taqê li hewa,
Te memik kirin nala (nola) hêkê kewa,
Te xortên xelkê h’elandin, bi wan rasta, bi wan
derewa...
Heçî navbeyna herdu dilên þêrîn, ji hevdu sar
kir,
Bila kula Þam û Helebê li mala bavê xwe yê kar
kir,
Xwedê bike mezinê wana bimirin,
Biçûkên wan nikaribin miriya barkin,
Tiþkê wan li darê del û dinya yê nemîne,
Werîs tune be, posta xwe li nav çavê tajî
biþidîne,
Ew tajî wana li dora fitlekê bajêr, çiv bi çiv
wana bigerîne,

Bi dû tajiyê xwe de, bi hewar kin, bê hey malxerabo,

veg
er mal!...

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Dilo!

Lo dilo! Hey lo dilo!
Xelkê me çû bûn çilo,
Dinya hemî zewicî,
Ez û gewrê man wilo.

Sîng û berê te gewr in,
Mîna dimis û firo,
Li ser destê xwe kiro,
Mîrê Bota re biro.

Lo dilo! Hey lo dilo!
Agir ket sênca reza,
Keti bû bexçê gula,
Ezê bi çeplê te bigrim,
Bavêjim taxa fila.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Dîlber

Þêxê Ebdilqadir

Lê dîlberê, bejna te zirave, taka vê Farûqê,
Lê Xwedê dizane þîn bûye li zozanê jorî, li mêrga Devzerûgê,
Heger sed û sî sal ji e’mrê mi here,
Taliyê ezê serê xwe deynim ser oxir û felekê,
te keçikê, te nezanê..
Wî bêmal, wî gundo, fesado li min..
Lê dîlberê ! bejna te zirave, taka vê çekemê,
Lê Xwedê zane þîn bûye li zozanê jorî, li mêrga Þamê,
Heger sed û sî sal ji e’mrê mi here,
Taliyê ezê serê xwe deynim ser oxir û felekê,
te nezanê, te e’cemê, ta zarokê..
Wî bêmal, wî gundo, fesado li min..
Keçikê digotî: gundîno! Malîno!
Nem (ne min) go çi ecêba hatî ser ecêbê,
Lê Xwedê zane, de lê, dilê mi keçikê,
Wele nizam, ne ji maliya, ne ji gundiya dil giran bû,
Berê xwe da welatê xerîbiyê..
Hunglîska destê mi çûye cêbê,
Gundîno, malîno !

Ezê di bextê we de, ma hûnê bi dû delalê dilê mi kevin,
Vegerînin ?
Bela (bila) bê malê, ezê ramîsanekê bidimê,
bi maliya çetine, li gundiya tim ecêbe..
Wî bêmal, wî gundo, fesado li min..
Lê dîlberê ! Ne mi gotê mere di her derîkê mere,
Wa bi gêro, î bi qundir re lê digêro,
Cotê memikê mi keçikê mîna du kewê gozel,
Bi sariya sibehê re li paþilka mi keçikê dikin þêreþêro,
Wê gavê t'ê (tu yê) bê mala bavê mi keçikê,
Xwezîka mi wê gavê, kalê bavê mi kor ba,
pîra dêka mi kehr û gêj ba..
Wî bêmal, wî gundo, fesado li min..
Destmala destê min qelemçî,
Tî bidim destê te mêrî, te egîtî,
Heger Xwedê nekir miradê min û te bi qîzanî,
Bela (bila) bikeve bi þûn da,
piþtî çar sala bimîne li ser darê di jinbîtî,
Wî bêmal, wî gundo, fesado li min!..

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

# Dînê

Ax lê Dînê û ax lê Dînê!,
Tirsa min j’ hebsa Merdînê,
Tu kevoka xebxebþînê,
Tu mêkewa l’ ser hêlînê.

Lo lawiko derewîno!,
Ne m’dxwazî, ne m’drewîno,
B’ avirê çava m’dxapîno,
B’ derdê dila m’dhelîno.

Çûm ziyareta Qulêbînê,
Memik hatin firotinê,
Xelkê tê da malê dinê,
M’ tê da ketka havînê,
Her çar mihê ber dotinê,
Her çar kejkê xwey hiþtinê.

Rengesmerê gulbarînî,
B’ xelkê tehl î, b’ min þêrîn î,
Tu beybûna Nisêbînê,

Tu mêkewa l’ ser hêlînê.

Heke tu memikfiroþ î,

Bi Quranê z’miþterî me,
Bi Quranê l’ ser mirî me.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Dûrik

Kaniya Hêlê li mêrgê ye,
ez xulam sê biskê þê ye,
Berda li alîkî bê ye,
T'ez kuþtim, t'ez helandim,
T'ez kirim duhnê çirê ye.

Bejin þiva dehlê ye,
Rûsor ji pelê gulê ye,
Þê bisk ji têlê perdê ye,
Her lê lê, her lê lê.

Sing û berê te gewr in,
Wek berfa li zozana,
Wek penêrê Qerece Daxê,
Serê memka hildayê,
Wek sêvê Meletyê yê,
Pirtiqalê Þamê yê.

Serê çelê zivistanê,

Destê van teresê beqala,
Davêjin ber terezînê yê,
Her lê lê, her lê lê.

Kaniya Hêlê li Merzeqa,
W'ez xulam enî bi deqa,
Ezê gewrê birevînim,
Emê xwe bavên her sê sinceqa,
Her lê lê, her lê lê...

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑

## Dûrik

De lê, de lê, de lê,
Mi dî bû li serê latê,
Esker çû taqîbatê,
Tu l’ser çavê mi’r hatê,
Ezê b’ çepilê te bigirim,
Xwe havêm qeza Qirqatê.

De bimeþ gewra’m bimeþ,
Ez xulamê çavê belekreþ,
Wan birhûyê te yên bi neqþ,
Roja ko mêrê te bimire,
Serê min û te l’dinyê bimînin xweþ.

Go: Îþev þeva sisiya ye,
Û dawetek digeriyaye,
Dilê mi ket diduyaye,
Ezê gewrê birevînim,
Ma xwe ne dinya bi derge ye.

Îþev êvara înê,
Melê dixwîne Yasînê,
Memik sêvê Mêrdînê,
Xwezla mi b’dilê wî xortî,
Ko cotê memka bibînê.

Îþev êvara Sebtê,
Memik sêvê Mehsertê,
De bimeþ, gewra m’ bimeþ,
Xulamê çavê belekreþ,
Roja mêrê te bimirê,
Serê min û te l’ dinyê bimîne xweþ.

❑❑❑❑❑❑❑❑❑❑